# PERWERDEYA DERSA ZIMANÊ DAYIKÊ

## Agahiya Serlêdana ji bo Beşdarbûna Dersa Zimanê Dayikê

Zimanê dayikê girîng e Hûn li malê bêyî almanî bi zimanek din diaxivin? Ev ji bo zarokên we dikare, gelekî bi kêr bê. Ji ber ku zarokên we zimanê dayikê xwe baş bizanin, ew dikarin almanî û zimanên din jî baştir fêr dibin. Ev di jiyana zarokan ya dibistanê û ya kar de gelekî bi fêde ye.

## Di perwerdeyê de teşwîqkirina Pirzimaniyê

Di dersa zimanê dayikê de zarokên we agahiyên xwe yên zimanê dayikê di aliyê têgihiştin, axaftin, xwendin û nivîsnadinê de berfirehtir dikin. Herwisa ew fêrbûnê bi taybetî di nava jiyaneke pirçandî de, xwe bêtir di nava ewlekariyê de hêst dikin, nirx û normên cuda hîn dibin.
Rêveberiya giştî ya dibistanên dewletê li Berlinê, salane ji bo dersên zimanê dayikê rêveberiyên dibistanan di derbarê rapirsîn û hejmara daxwaziya serlêdanên zimanê dayikê de agahdar dike. Ji bo ku bi zimanekî, dersên zimanê dayikê bên dayin, divê hinek mercên wek hejmara zarokan û hin şertên din pêk werin.

**Tomarkirin/qeydkirina dersa zimanê dayikê, dikare bi vî awayî bê çêkirin:**
Forma qeydikirina zimanê dayikê dagirin û bidin mamosteyên polê/sinifê an sekreteriya dibistana zarokên xwe.

**Dersa zimanê dayikê di xalên jêrîn ji bo zarokên we dibe alîkarî û piştgirî:**

- Zimanê dayikê xwe baştir biaxive û binivîse,
- Zimanên din fêm bike û zûtir fêr bibe,
- Nasîna çand û nirxên cuda,
- Xurtbûna têkiliyên bi malbat, mirov û kesên din yên li welatê xwe re,
- Serbilindiya bi şarezahiya têgihiştina zimanî,
- Xurtbûna xweşbînî/tolêrans û fêmbariyê,
- Zêdebûna derftên şansê pîşeyî/meslekî.